# Ahenga bîranîna Seydayê Cegerxwîn Li Qamişlo hate lidarxistin

**Bi** helkeftina 23 yemîn salvegera koçkirina Seydayê **CEGERXWÎN**, Komîta Kovarên Kurdî Li Sûriyê, ahengeke rewşenbîrî, êvara 22.10.007 an, li ser gora nemir **CEGERXWÎN** li bajarê **Qamişlo** li dar xist.

Bi beşdarbûna dora 200 kesî ji rewşenbîr, çalakvan, welatparêz û navdarên kurd, demjimêr 18:45 bi rawestana kêlîkeke bê dengî li ser giyanê helbestvanê me yê gewre Seydayê **Cegerxwîn,** ahengê destpê kir.

Di nerîna me Kovarên Kurdî Li Sûriyê de, tevî hin kêmasiyên derbasbûyî, şev bi rengekî xweş û serkeftî bi dawî hat. Kêmasiya serke ew bû ku hin ji helbestvan û rewşenbîrên me yên giranbuha derfeta xwendina berhemên xwe ji ber tengbûna demê nedîtin, ewa ku li ba me cîgehê mixabinî û hêviya lêborînê ye.

Xala din a cîgehê balkêşî û şanaziya me ye ewe ku ev karê me yê hevbeş, rêzgirtin û rûmeteke taybet û berbiçav li nik rewşenbîrên me yên xoşewîst dibîne. Di vî warî de, em hêvîdar in ku di paşerojê de, ji bo pêşvebirin û geşkirina rewşenbîriya kurdî li Sûriyê, em ê di asteya hêvî û baweriyên wan de bin.

Li dawiyê, em sipasiya hemî beşdaran dikin, û ji bo kêmasiyan, careke din lêborînê dixwazin.

**Komîta Kovarên Kurdî Li Sûriyê**
**26.10.2007**

## Gotina Kovarên Kurdî Li Sûriyê Di bîranîna 23 saliya koçkirina Seydayê Cegerxwîn de

Di bîranîna 23 saliya koçkirina Seydayê Cegerxwîn de, em bi navê kovarên kurdî yên li Sûriyê têne weşandin (**Aso, Pirs, Gulîstan, Deng, Gelawêj, Newroz, Perwan, Roj, Jîn, Vîn, Ziman**) û bi navê hemî pişgirên ziman û wêjeya kurdî, vê bîranînê bi bîr tînin û xêrhatina we dikin.

Bi helkaftina vê bîranînê ku 23 sal di ser koçkirina Seyda Cegerxwîn re derbas bûne, em bîst û sê gulên rengîn diyarî gorna wî dikin, bîst û sê bîranînên din em bi hev re bixemilînin û di bin siya mijankên rist û helbestên wî de, tevna rewşenbîriyê li dar xînin, bîst û sê singan ji pênûsa qederê li ser sînga kaxezan biçikînin, nemaze, pevhûnandina helbestvan, rewşenbîr, siyasetmedar bi hev re di yek qelafetî de, sira hênik in, yadîgar in, evra ne, her di nerîn û rewşa xwe de zindî ne.

Bi navê prensîpên mirovatî, zagon û yasayên mafnasiyê û rewatiya navnetewî, bi navê rewşnebîrên ku roleke ronak dilîzin û çavên wan li ser dîmenê xwerista zemînê dikutkutin û pişgiriyê didin geşbûna zimên û çelengiya şeng, **D.R.(10)**